

06.11.2020

Lîsteya Daxwazan


# Jinkujiyê Bisekinînin!

Xilaskirina Tundûtujiya Dijî Jinan\*  
di Yekitiya Ewropayê de

# Naverok

Rewşa heyî	04
Pirsgirêkên di têkoşîna li hemberî jinkujiyê de	05
Daxwaz	06

## Berpirsiyar ji bo hemû naverokê



## Hevkarên xebatê



**Ekmek ve Gül**  
(Tirkiye)



**UMAR - Women's Union**  
Alternativa e Resposta  
(Portegîz)



**Pangea Reama**  
(Îtalya)



**Research Centre of Women's Affairs**  
(Yewnenîstan)



**Femicide Observation Center**  
(Almanya)



**100**

**Dr. Jasna Podreka**  
University of Ljubljana  
(Slovenya)



(Tirkiye)



**PATENT Association**  
(Macarîstan)

**Dr. Monika Schröttle,**  
Coordinator of the European  
Observatory on Femicide  
(Almanya)

## Têbînî derbarê bikaranîna termên xweyî hişyariya zayendî

Wekî rêxistinek sêhwanî a femînîst a interseksiyonî ji bo jinên\* koçber DaMigra e.V. îşaretekê stêrkî li peyvan zêde dike ku behsa pergala zayenda dujimarî dike. Ew avahî û cihêrengiya zayendî girîng dike.

# Rewşa heyî

Li gorî îstatîstîkên Rêveberiya Dermanên Tiryak û Sucan a Neteweyên Yekbûyî her roj 137 jin\* an jî keç\* ji aliyê malbatên xwe an jî hevjinê xwe yê berê ve tî kuştin.<sup>1</sup> Ev jî salê dike 50.000 hezar qurbanî.<sup>2</sup>

Ev hejmara ku nêzîkê hejmara qurbanîyên şerê navxweyî ya li Suriyê ye, ku di nav 20 mehên pêşî yê şerê dora 40.000 mirovan ji jiyana xwe dest dan, mirov gêj dike û pirsgirêkeke cîhanî dest nîşan dike. Lê belê, hejmara jin\* û keçên\* tî kuştin li seranserî dinyayê zêdetir e, lê derbasî qeydan nabin ji ber kêmasiyên daîmî yê rêbazên binavkirin û berhevkirina daneyên derheqê kuştin û tundûtujiyên zayendî de.

Jinkujî, yanî kuştina jin\* û keçan\* ji ber zayende wan,<sup>3</sup> ku di Peymana Pêşgirtin û Têkoşîna li hemberî Tundûtujiya dijî Jinan û Zordariya Malî ya Konseya Ewropayê hatiye pênasêkirin, bi navê xwe yê din Peymana Stembolê, bi gelek şiklan derdikeve pêş mirov.

Jin\* û keç\* qurbanîyên gelek cureyên tundûtujiya zayendî ne: dema jicibûn û penaberîyê de dimirin, û ji ber sedemên wek xebata cinsî, sinetkirina jinan, sucên rêxistinkirî, sucên firotina derqanûnî ya dermanên tiryak û mirovan, zordariya hevjinan, îşkence, xwekuştin di encama tundûtujiya derûnî de, kuştina ji ber “namûsê” an jî tercîhên cinsî û nasnameya zayendî û hwd. ji jiyana xwe dest didin.

Tundûtujiya dijî jinan ne sînorkirî ye li hinek welatan û mijareke takekesî nîne. Kêşeyeke gerdûnî ye û koka wê digihe rolên li gorî zayendê hatine diyarkirin û serdestiya pederşahiye.

Zêdebûna zelal ya tevgerên tundra û nijadperest di salên dawî de gef û tehdîtên zêdetir çêdike li hemberî jin\* û keçan\* . Çi tundra wiya milên rast be, çî dij-feminîst an jî tevgerên olî yê rêhişk be, ev alî hemû li ser dijberiya jin\* û keçan\* lihevkiirî ne.

Ev tevgerên dijfeminîst û nijadperestên dengê wan zêde derdikevin van salên dawî de, her wiha bandoreke neyînî li ser xuyabûn û ewlehiya civaka LGBTQI çêdikin.

1 Ev agahî li gorî vê raporê ye: “Têkoşîna li dijî tundûtujiyê li hemberî jinanê” ku di Mijdara 2016’an de hatiye çapkirin ji aliyê Rêxistina Ewlehî û Hevkariyê li Ewropayê (OSCE), Lînk: <https://www.osce.org/files/f/documents/e/2/286336.pdf> (Status: 02.11.2020).

2 Neteweyên Yekbûyî Tiryak û Suc (2019) “Lêkolîna Cîhanî li ser Kuştinê: Kuştinên zayendî ya jin\* û keçan\* , Vîna”, r. 10, Lînk: [https://www.unodc.org/documents/data-and-analysis/gsh/Booklet\\_5.pdf](https://www.unodc.org/documents/data-and-analysis/gsh/Booklet_5.pdf) (Status: 15.07.2020).

3 Neteweyên Yekbûyî Konseya Aborî û Civakî (2013) “Daxuyaniya Vîenayê li ser Jinkujiyê”, Lînk: [https://www.unodc.org/documents/commissions/CCPCJ/CCPCJ\\_Sessions/CCPCJ\\_22/\\_E-CN15-2013-NGO1/E-CN15-2013-NGO1\\_E.pdf](https://www.unodc.org/documents/commissions/CCPCJ/CCPCJ_Sessions/CCPCJ_22/_E-CN15-2013-NGO1/E-CN15-2013-NGO1_E.pdf) (Status: 10.09.2020).

Naskirina jinkujiyê ku dibêje kuştina jin\* û keçan\* ji ber zayendê wan, ku dikare, ji xeynî hinekê din, di van şiklan de pêk were: (1) kuştina jinan di encama tundûtujiya ji hevjinêkî nêz; (2) îşkence û kuştina jinan ji ber nefreta ji jinan; (3) kuştina jin\* û keçan\* li ser navê “namûsê”; (4) kuştina qestî ya jin\* û keçan\* di nav şerekê çekdarî de; (5) kuştina jinan ji ber qelenê; (6) kuştina jin\* û keçan\* ji ber tercîhên wan ên cinsî an jî nasnameya wan ya zayendî; (7) kuştina jin\* û keçên\* aborjîn an jî xumalî ji ber zayenda wan; (8) kuştina keçên nû hatine dinê û kuştina cenînan ji ber zayenda wan; (9) mirinên di encama sinetê de; (10) tawanbarîyên pîrebokiyê; û (11) jinkujiyên din ên bi çete, sucdariyên rêxistinkirî, firoşkarên dermanên tiryakê, revandin û firotina mirovan û mezinkirina artêşên biçûk...”

# Pirsgirêkên di têkoşîna li hemberî jinkujiyê de

Gelek sedemên civakî hene ku têkoşîna li hemberî jinkujiyê zehmet dikin. Mirov dikare 5 sedemên herî girîng wisa rêz bike:

## Desthilatdariya newekheviya zayendî di navbera jin\* û mêran de

Hingî nîşandana pederşahî û zayendperest a jinan wek obje di nav civakê de serdestiya xwe berdewam bike, ew ê jin\* û keç\* êşa cureyên tundûtujiya zayendî yên me jorê behskirî bikişînin.

## Zimanê medyayê û zimanê rojane

Tundûtujiya zayendî li hemberî jin\* û keçan\* tê normalkirin û kêmkirin di axaftinên me yên rojane û zimanê medyayê de. Gelek caran di rêzefîlman de dibin mijarên wek “dramaya malbatî”, “kuştina namûsê”, “kuştina ji ber cudabûna ji mêrê xwe” û “kuştinên ji ber hesûdiyê”. Ev yek binavkirina jinkujiyê zehmet dike û têkoşîna li hemberî van kuştin û zilman dixwe xetereyê.

## Bikar(ne)anîna terman û tunebûna stratejiyên neteweyî û tevEwropayê

Binavkirineke giştî ya ku ji aliyê her kesan ve tê qebûlkirin a jinkujiyê tune. Lewma, qeneatên heyî diguherin û rê didin ku pirsgirêk bi hemû aliyên xwe ve neyên fehmkirin. Her wiha, heta niha welateke Ewropayî derneketiye ku stratejiyek giştî a neteweyî amade kiribe di têkoşîna li hemberî jinkujiyê de. Hinek çareseriyên mehelî, herêmî û nimûneyên li hinek welatan hene. Stratejiyeye berfireh a Ewropayî jî hêj tune.

## Tunebûna hişyariya aliyê xesara aborî

Encamên mezin ên aborî yên tundûtujiya zayendî û jinkujiyê jî hene. Konseya Ewropayê texmîn dike ku xesara aborî ya tundûtujiya navmalî tenê serê xwe her sal dibe €555 serê her kesekê.<sup>4</sup>

## Kêmasiyên emilandina alavên heyî di têkoşîna li hemberî hemû cureyên tundûtujiyê li ser jin\* û keçan\* de

Ji nav çend xalên girîng, armanca sereke ya “Peymana Pêşgirtin û Têkoşîna li hemberî Tundûtujiya dijî Jinan û Zordariya Navmalî ya Konseya Ewropayê”, bi navê xwe yê din Peymana Stembolê, ew e ku jin\* û keçan\* rastî tundûtujiyê dibin biparêze, piştgiriya xebatên xilaskirina hemû cureyên cudageriyê li dijî jinan bike, û bi riya gav û pengavên berfireh ên siyasî û her wekî din çarçoveyên qanûnî derxe ku ji aliyekê qurbanî werin parastin û ji aliyekê din ve jî kiryarên van sucan werin darizandin. Bikaranîna van rê û rêbazên mafên jin\* û keçan\* perçeyeke esasî ya têkoşîna li dijî jinkujiyê ye.

<sup>4</sup> Konseya Ewropayê (2016): Destpirtûk ji bo parlementeran. Konseya Ewropayê Peymana Pêşgirtin û Têkoşîna li hemberî Tundûtujiya dijî Jinan û Zordariya Malî ya Konseya Ewropayê (Peymana Stembolê), p. 16 <http://www.assembly.coe.int/LifeRay/EGA/WomenFFViolence/HandbookParliamentarians-EN.pdf> (Status: 12.11.2020)

# Daxwaz

Wek saziyên mafên jin\* û keçan\* ji welatên cuda yên Yekitiya Ewropayê, em dixwazin hemû gav û pengavên bikaranîna Peymana Stembolê yên li jêr hatine rêzkirin bi awayekî qanûnî werin qebulkirin ji bo ku jinkujî were sekinandin di Yekitiya Ewropayê de:

**A. Divê saziyên mafên jin\* û keçan\* bikarin cih bigirin di nav hemû qadên xebatên parêzkarî, amadekirina çarçoveyên nû û pêvajoyên biryar-çêkirinê de ji bo ku Peymana Stembolê bi awayekî rêkûpêktir were bicihanîn!**

Saziyên mafên jin\* û keçan\* qadên ewle û derfetên piştgiya civakî yên mîna piştgiya derûncivakî, alîkariya qanûnî û xizmetên tîbbî ji bo wan jin\* û keçan\* ku rastî tundûtujiyê hatine. Lewma, ev sazî pêdiwiyên taybet ên jin\* û keçan\* tundûtuji hatiyê serê wan baştir fehm dikin.

- Divê Yekitiya Ewropayê saziyên jin\* û keçan\* bi awayekî temamî nas bike, bi wan re bixebite û alîkariya aborî bike ji bo ku stratejiyên destekarî û pêşgirtinê werin xurtkirin di têkoşîna li hemberî jinkujiyê de! (Xal. 9)

**B. Pêdiwiyê lezgîn e ku hikumet bi awayekî sistematîk derbarê jinkujiyê de daneyan berhev bikin, civakê agahdar bikin û xebatên bilindikirina hişyarî pêk bînin.**

Têkoşîneke karîger û berdewamker li dijî jinkujiyê tenê wê wextê pêk tê dema ku hikumet rêbazeke pîralî ya navbeşî bidin ber xwe ji bo lêpîrsîna kuştinên jin\* û keçan\* ji ber zayenda wan. Her wiha hewcedariya me bi parvekirina agahiyên sazîbûyî derbarên cureyên cuda yên tundûtujiya li hemberî jinan heye.

- Pêdiwî ji bo wê yekê heye ku jinkujî bi awayekî berfireh û yekgirtî were pênasekirin û komên cuda yên qurbanîyan bi awayekî zelal werin binavkirin.

- Divê hikumet têra xwe çavkaniyên mirovî û aborî veqetînin ji bo şerê hemû cureyên tundûtujiyên di Peymana Stembolê de hatine behskirin li hemberî jin\* û keçan\* , tundûtujiya sîber jî nêv de! (Xal. 8)
- Berhevkirina daneyan ji aliyê hikumetan bi awayekî rêkûpêk ji hemû dezgehên berpirsiyar û lêkolînên beşên eleqedar hewce ye ji bo bicihanîna pengavên parastin û piştgiya jin\* û keçan\* rastî tundûtujiyê tîn! (Xal. 11)
- Em dixwazin nîşandana jinkujiyê di zimanê rojane û medyayê de wek çand bê sekinandin. Em dixwazin kuştina jin\* û keçan\* wek jinkujî were naskirin!

**C. Em di hemû qadên civakê de pirrengî û pengavên parzvan ên xweyî hişyariya zayendî dixwazin!**

Baştirîn riya kêmkirina jinkujiyê kêmkirina tundûtujiya zayendî ye! Ji bo ev yek pêk were, divê hemû astên civakê werin perwerdekirin ji bo tundûtujiya zayendî baştir nas bikin, qeyd bikin û berpirsiyaran agahdar bikin û her wiha normên civakî û qeneatên dijberiya jinan dikin werin guherandin.

- Hewcedarî pê heye ji bo kampanyayên hişmendiyê yên pîralî ji bo di şerê li dijî tundûtujiya zayendî de û her wiha ji bo piştgiya mafên jin\* û keçan\* de. (Xal. 13) Divê karîgeriya van kampanyayan her tim werin nixandîn.
- Divê perwerdehiyeke xweyî hişyariya zayendî were dayîn di dibistanan de û her wiha pirtûk û mamosteyên\* pirreng û zayend-hessas! (Xal. 14)
- Divê xebatkarên ji paşxaneyên pirreng, pîrziman û xweyî hişyariya zayendî hebin ku serlêdanên penaberiye dinêrîn û dinirxînîn û her wiha prosedûran dişopînin (wek nimûne, polîs, wergêr, xebatkarên civakî, xebatkarên tenduristiyê)! (Xal. 15)

- Hewcedarî heye ji bo bernamêyên başkirinê yê xweyî hişyariya pirrengî ji bo hemû cureyên tundûtujiya li hemberî jin\* û keçan\*! (Xal. 16)
- Hewcedarî heye ji bo alavên şopandina zimanê xweyî hişyariya zayendî di medyayê de û cezayên fermî li hemberî gotinên ku gefan li jin\* û keçan\* dixwin û wan şermezar dikin. Ev yek ji bo medyaya civakî jî derbasdar e! (Xal. 17)

#### D. Em daxwaz dikin pengavên berfireh yê piştgiriya amade bibin ji bo kesên parastinê dixwazin!

Di nav pengavên karîger li hemberî jinkujiyê de yek ew e ku pêdiwiyên bingehîn ên jin\* keçên\* tundûtujiyê dijîn bi awayekî lezgîn werin bersivandin ji bo ku bikarin xwe ji têkiliyên zordar û malbatên xwe xilas bikin. Divê bernamêyê berfireh a xizmetên alikariyê jî hebe ku pirziman be û çavkaniyên dengî û videoyî jî tê de bin ji bo danûpêdaneke bêasteng.

- Em dixwazin jin\* û keç\* bikarin bêcudagerî û bêastengî xwe bigihînin dezgehên piştgiriya û stargehan (malên parastinê)! Di nav dezgehên de, divê navendên şewirmendiyê (her wiha di cihên herêmî de jî), stargeh û rêveberiyên pêkanîna qanûnan jî hebin! (Xal. 18)
- Em dixwazin xizmetên alikariyên taybet ên pirziman û xweyî hişyariya pirrengî hebin, nexasme terapiya derûniyê ji bo kesên parastinê digerin! (Xal. 22))
- Gav û pengavên li gorî pêdiwiyên cuda yê tenduristiyê ji bo jin\* û keçan\*, taybetî jî baldariyê berbiçav ji bo saxkirin û piştgiriya tenduristiyê hişî, hewce ne. (Xal. 22)
- Em dixwazin jin\* û keç\* bikarin bêcudagerî xwe bigihînin stargehan. (Xal. 23)

- Pêdiwiyê lezgîn e ku pengavên qanûnî werin amadekirin û fermîkirin ji bo terxankirina stargehan, saxkirinê, piştgiriya û parastinê ji bo hemû jin\* û keçên\* dibin qurbanîyên tundûtujiyê û hewceyê pêdiwiyên taybet in (bo nimûne, jinên fîzîkî an jî hişî berasteng û pîrejîn). (Xal. 23)
- Em dixwazin xetêke alikariyê ya pirziman 24/7 (hefteyê her roj û 24 saet) were damezrandin ji bo agahiyên bide derbarê cureyên taybet ên tundûtujiya zayendî de! (Xal. 24)
- Divê zarok û ciwanên bûne qurbanîyên tundûtujiya zayendî bikarin werin guhdarîkirin di dozên ku tesîrê li ser wan dike de ji bo piştrastkirina ewlehiya wan û ya dayikên wan. (Xal. 26)
- Di dema dozê de pengavên taybet ên parastinê hewce ne. Taybetî, divê nirxandina ewlehiyê were kirin di rewşa hevraştatin û mafên welayetiyê de. Divê bi awayekî fermî were qebûlkirin ku ev yek ne zarokan ne jî qurbanîyan bixe xetereyê. Mafên welayetiyê û hevdîtinê ji bo zarokan divê li gorî pêdiwiyên taybet ên qurbanîyan werin sazkirin û alikariyê bike ku xirabiyên berê dubare nekin û jinkujî pêk neyê. (Xal. 31)
- Gelek zarok dibin sêwî ji ber ku dayikên wan tên kuştin. Mirina dayikên wan, taybetî dema ji aliyê kesek din ên ji malbatê werin kuştin, encamên pir xirab derdixin. Lewma, gelek girîng e ku piştgiriya taybet, rêkûpêk û berdewamî were dayîn û zarokên bûne qurbanîyên jinkujiyê û taybetî yê bûne sêwî werin lêxweyîderketin.
- Ji bo pêşiya jinkujiyê were girtin, kesên ku tûşî tundûtujiyê bûne an jî bi awayekî xeternak hatine tehdîtîkirin, divê bikarin navê xwe û hejmarê xwe ya ewlehiya civakî biguherînin.
- Divê wekhevî û beşdariya ewle ya jinan di bazara xebatê de were mîsogerkirin. Serxwebûna aborî faktoreke diyarker e di têkoşîna li dijî jinkujiyê û tundûtujiya li hemberî jinan de. (Xal. 18)

- Em dixwazin pengavên guncaw û karîger werin girtin ji bo ku hemû cureyên sinetkirinê nav keç\* û jinan\* de werin sekinandin û doktorên li ser van mijaran hatine perwerdekirin werin peywirdarkirin û navendên şewirmendiyê hebin ji bo kesên qurbanî! (Xal. 38)
- Divê hemû dezgehên fermî û komeleyên civakî yên bi jin\* û keçên\* bûne qurbanîyên tundûtujiya zayendî bi awayekî hişyar endamên komên xwe hîlbijêrin û wan bişopînin, kesên xweyî hişyarî di van mijaran de tercîh bikin. Divê ev kom û kes perwerdehiyên hewce di pêşlêgirtin û tespîtkirina tundûtujiyê, wekheviya zayendî, maf û pêdiwiyên qurbanîyan û pêşlêgirtina qurbanîbûna asta duyemîn de bigirin. (Xal. 5 û Xal. 15)
- Pengavên lezgîn lazim in ji bo parastina jin\* û keçên\* rastî tundûtujiya ducanîti re eleqedar hatine. Divê demildest were qebûlkirin ku ev jî cureyeke tundûtujiyê ye. Divê pêvajoyên ducanîti re eleqedar yên bê destûra jin\* û keçan\* bi awayekî aşkere wek suc werin naskirin. (Xal. 5)
- Em dixwazin dersînorkirina jin\* û keçan\* li herêmên şer û pevçûnan, ku ew nikarin li wan deran mafên xwe yên mirovî bi kar bînin, demildest were sekinandin! (Xal. 60)
- Em dixwazin testên nijadperest, dermîrovî, tacîzkar û cudager ên li dijî penaberên LGBTQI werin sekinandin û pêvajoyek dadyane û karîger were meşandin ji bo serlêdanên penaberiyê. Em dixwazin dersînorkirina penaberên LGBTQI li hemû welatên ku nikarin mafên xwe yên mirovî bi kar bînin demildest were sekinandin! (Xal. 60)

## E. Gelek elzem e ku hemû jin\* û keç\* bikarin xwe bigihînin pengavên piştgiriye!

Jin\* û keçên\* xweyî paşxaneya penaberî an jî koçberiyê rû bi rû dimînin bi cudageriyeke piralî, wek nijadperestî û cudageriya heterozayendperest. Her wiha hewcedariya wan bi perspektîfek taybet heye ku divê li ser cudageriyê bisekine li gorî destûra wan ya runîştinê.


- Em dixwazin Peymana Stembolê bi awayekî bêcudagerî were bicihanîn - bêyî ku zayenda bedenî, nasnameya zayendî, nijad, rengê çermê, ziman, bawerî, baweriya siyasî an jî yên din, paşxaneya etnîk an jî civakî, endametiya kemîneyek netewî, jidayikbûn, tercîha cinsî, temen, statûya tenduristî, berastengî, rewşa zewacê, statûya koçberî an jî penaberî û her wiha statûyek din a jin\* û keçên tundûtujiyê dîtine were lênêrîn! (Xal. 4)
- Destûra runîştinê a serbixwe ji bo jin\* û keçên\* koçber an jî penaber hewce ye ji bo ku tu jin\* nebin derqanûnî û hemû jin\* û keç\* bikarin sûdê wergirin ji pengavan! (Xal. 59)
- Em dixwazin hemû dewletên Peymana Stembolê îmze kirine hemû pengavên hewce qebûl bikin ji bo ku jin\* û keçên\* rastî sinetê, destdirêjiyê, zewaca bêdil û hemû cureyên din ên tundûtujiya zayendî hatine bikarin mafê xwe yê serlêdana penaberiyê bi kar bînin! (Xal. 60)
- Em bang dikin ku pengavên hişk werin girtin ji bo kesên tundûtujiyê dikin demildest ji malê werin dûrxistin dema bi qebheha wan tê pêhesîn. Divê dubare maxdurkirina jin\* û zarokan neyê qebûlkirin ji bo pêşî mafê kesê jê tê qumankirin jî were parastin. (Xal. 52)
- Em bang dikin ku têra xwe navendên lezgîn hebin ji bo qurbanîyên tundûtujiya zayendî, ku ji van navendan bikarin piştgiriya travmayê û şewirmendî bigirin, daneyên tîbbî û agahiyên çavdêran werin wergirtin, û qurbanî bikarin çend rojan bimînin heta rewşa wan baştir be. (Xal. 25)
- Em bang dikin ku krîterên zelal ên suca cinsî ya tundûtujiyê hebin û di qanûnan de bi eşkere cihê xwe bigirin. Divê hebûn an jî tunebûna destûrê were hesabandin di çarçoveya şert û mercên derdorî de. Divê destûra kesan bi awayekî dildarî be, bi rîya tercîha azad a kesan. (Xal. 36)

## F. Bi awayekî lezgîn hewce ye ku pengav bi awayekî hevkarî werin girtin û şopandin!

- Em dixwazin Peymana Stembolê ji aliyê Yekitiya Ewropayê were naskirin. Divê Yekîti ji dewletên endam bixwaze ku ev peyman were bicihanîn û dewletên vê yekê nekin werin cezakirin.



- Rêberên yekgirtî û hevpar hewce ne ku Yekîtiya Ewropayê pê emel bike ji bo têkoşîneke çalak bi rê ve bibe li dijî jinkujiyê.
- Em bang dikin ku aboriyeke berdewamker û rêbazeke piralî ya berhevkirina daneyan di qada Ewropayê de hebe. Xebat û çalakiyên ku Çavdêriya Ewropayê li ser Jinkujiyê (EOF) li ber çavan bînin girtin..
- Polîtîka û hevkarîyên hevgerî di navbera hemû aktorên mîna dezgehên dewletî, parlemento û beşên berpirsiyar ên netewî, herêmî û mehelî, sazîyên netewî yê mafê mirovan û komeleyên civaka sîvîl de lazim in ji bo qurbanî bi awayî rêk û pêk werin parastin. (Xal. 7)
- Divê karîgeriya pengavan bi awayekî serûber were çavdêrîkirin di qada Ewropayê de.



**Navnîşan**

DaMigra e. V.

Dachverband der Migrantinnenorganisationen

Am Sudhaus 2

12053 Berlin

[damigra.de](http://damigra.de)

**Têkilî ji bo çapemeniyê**

Mail: [presse@damigra.de](mailto:presse@damigra.de)

Phone: 030 255 685 12

